



ENCÛMEN



Ji weşanên Nivîsgeha çand û Ragihandina Encûmena nîştîmanî kurdî

Weşanên siyasî - çand - huner - civak - wêje

Sernivîser-Yusra Zibêr

Lêvegera Ziman- Mihemed Kose

Desteya birêvebir

Ferhad Şêxo

Mihemed Kose

Ji bo têkiliyên We bi Me re

Li ser Amêlê

Rojname .enks@gmail.com

Jmar 11

Pêşgotin

Devera Aram wê ji kê re Aram be?

Hemî Hêzên xwedan Bandor di Berîvghaneke dene bi Demê re ku Devera Aram şewaz bikin ligor Berjewendiyên xwe yê Ramyarî niha û ên Abûrî paşê Rusya ta wek aneha tu Rêveberiyê na pejirêne heger Rijêma Esed nevegere û Rêveberîk navcihî çandî wêneyî. Civîna Potîn -Erdoxan tu Encam nedan liser lihevkiyekê yan protokolek jibo Devera Aram ,ji bilî Bazarekê dinavbera Deverên Idlibê û Rêveberiya Devera Aram. û li hember vêna Welatên Emêrkî Yekgirtî armançdikir avakirna Lêşkerekî welat perwere ji Pêkhatiyên Deverê bi Erkên paristinaî Sinorê hevbeş bi Turkiyare, û ew Helwêst hate dan jiber ku Behweriya wan bi hevbendên wan re nema (PYD) ên ku bi wanre Şer dikin lê Petrola xwe difroşe Iranê . Li vêde Deselata PYD Danûstandinan û Geryanên Mekûkî û beravejoy dirabe , carna li Dîmeşqê ye û carne dî li Rusiyên ne û jixwe digel Welatên Emêrkîji dibe. Turkiya deverek Aram bi Reveberiya hevbendên wê yê Ereb û Desthilatedar Hemhingiya Opusutione yê ku derbasbûna Pêşmergên Rojava na pejirênin ên ku destdrêjkirna hevbendên Turka û Lêşkerê Turk bi Sînordanbike. Ligor wan herçar Sînyaroyên bihûrî wê çî Paristin û Aramî heye ji devrê û ji Miletê Kurd re durustbibe . Vegera Rijêmê bi çî Şewazekî be bi Bazarekê ji bal PYD re wê wêrankirne bi ser Rêkbera Rijêmê de bênin, wek li Deverên lihevhatin welatperwerî rûdidan. Heger Lêşkerê Turk û girupên Çekdar derpas bibn wê Çarenûsa Deverê ji Çarenûsa Efrînê cudanebe ya kuştin û dizî Nav û Nîşanên her berztirin ji Rêveberiya Turkan û Giropên Çekdar re. Li hember wan herdû Rengan xirab dive Reveberiya Emêrkî bi Şaşîtiya serok Trumb bighêjin û bizanin ku Berjewendiyên Emêrkî û Paristina Miletê Kurd wê liber Bayê Firebûna Rûsiya û Rijêmê yan Turkiyê û Hêzên Radîkal bimênin . Di Hundirê Kongrêsa Welatên yekirtî ev yeka tê guobêjkirin ji Şeva 29 Çira paşî û heye ku Biryara xwevekêşnê ji Sûriyê û avakirna Deverek Aram wek ya ku li Kurdistana îraqê duristbû Sala 1991 tevî Qedexkirna Asmanî û ligor vê Buçûnê bitenê heye Aramya Miletê Kurd bê çespandin û yan wê Devra kurdî Şepoleke Mişextbûnê Mezin bibîne û Guhertineke Dîmografî bi Derbasbûna Melyonên Ereban yê li Turkiyê dijîn û Xewna Miletê kurd bi Azadiyê cardî beravêtî bibe . Ma em bi pirsin gelo Hez û Partên kurd tê dighin Çend Metirsî û Mergezad bi Devera Aram re tèn heger Rolek Kurdan Naverokî nebe di Nexîşdanan û Duristkirna Devera Aramde.



Ebdela
Gedo

?Rojhilata ferat.. Çima îro

Rojhilatî ferat kaniya petrol û genim û pembo ye, liser sînorê turkiye û îraqê ye, desthilata rêjîmê û ya partiya yekîtiya demuqrat p y d li wê deverê hukum dike. û emêrika wê deverê weke para xwe didît ji sala 2015 ve, çek û cebilxane û bingê leşkerî li wê deverê belavkirbû, da ji rûsyan re bêje, ez hevparim di sûryê de, û divêbe ku çareseriya pirsgerêka sûryê li gora berjewendiyên me bin, belê ji avdara çûyî ve serok tramp xwe vekşanidina hêz û leşkerên emêrkî tîne ziman, ji ber gelek fişar û sedemên emêrkî hundirî, û ji bo ku bide xuyan ku pabende bi sozên xwe yê hilbijartinê, tevî ku "pintagon" û gelek deste û kesayetên biser hukûmetê ve û yê dî, xwevekişandinê weke bêbextiyekê dibînin derbarê hêzên sûriya demuqrat(h s d) de, ku beşdarî cenga li dijî (daiş) bibûn li reqa û dêra zorê û deverên dî. pyd ku weke hêza sereke di "h s d" de tê nasîn, ti riyê li pêşiya xwe nabîne ji bilî ku vegre dan û standin û li hevhatinê bi rêjîmê re, û dixwaze ku bi encûmena niştimanî kurdî re jî lihev bê, da ji xwe re rê veke bi rikberiya sûrî û dostên wê re, belê ta anha ti birsivên zelal negane dest pyd. Digel zirtê ku turkya dike bo êrîşkirina rojhilata ferat, û dozkirina avakirin herêma .aram li wê deverê

Serhan Isa: Kurd û Şûreşa Sûrî Xeleka 8

5- Qûnaxa parçebûnên siyasî

Em Kurd ên Kurdistanê Sûrî, tevî ku em miletekî zindî ne û ji Sedê salan ve li ser axa xwe ya dîrokî dijîn û bi Dehan partî û rêxistinên me yê siyasî û sivîl hene, û xwedî serpêhatiyek zengîn û sitewihayî ne di xabata siyasî û sivîl de, lê dîse jî em dibînin ku Rikaberîya Sûrî, û di serî de çîna **Liberal û Sîkolarizim** bi şeweyekî pir nizim, erzan, û bê binyatek zanistî û dîrokî nêzîkî dîrok û hebûna me dibin?!

Ev çewtnerîn û danûstandina van hevparên me tê wê wateyê ku ew hîna nikarin xwe ji hizra netewperistina Şofînzim û radîkal rizgar bikin. Ew di bingeh û binyatên xwe de **Şagirtên Dîbistana Bais a Şofonist in.**

Jimarek pir mezin ji Şagirtên vê dîbistana tundrew û bê exalq dema li ser Şûreşa Sûrî di herêmên Kurdistanê de diaxivin dibêjin ku di destpêkê de xortên Ereban bi Şûreşê rabûne???!?

Lê ev dereûvanên Sed sala Bîstûyekê ji xwe napirsin ka gelo ew Xort kî bûn?? kengî bûne Şûreşger û kî serperîştîya wan dikir?? Û çend meş û xwepêşandan li darxisitine?? Çend baregeh û damûdezgehên Dewletê herivandine???

Qêrîn û hawarên Xort û Keçên Kurdistanê li kolanên Rîkin Al Dîn a Şamê û Al Aşrefiyê a Helebê, Camiya Qasimo li Qamişlo, Amûdê, Efrînê, Hisiçe, Derbasiyê, Dêrikê, Tirbespiyê, Çelaxe, Serêkaniyê û hemî gund û bajarên kurdî Jibîrkirin?? **Hey Şagirtên Efleq.**

Rastiya Dîrokî a ku em ê tu carî tenazil jê nekin ew e , **ku çira û çirawîskên Şûreşê bi destê xort û keçên Kurdistanê hatin pêxistin û bilind kirin.**

Tevî ku me di xelekên derbasbûyî de jî bal kişande ser vê mijarê lê dîse pêwîst bû ku em vê kurtenerînê weku kurtebersîvekê bihinêr in ji **Tundrew û Şofînzimê Rikaberîya Sûrî yê bê Exaq re.**



Pendeke Kurdî heye dibêje: Dostên kev in Hespên Zînkirî ne.

Piştî ku Şûreş di herêmên Kurdî de bi awayekî fermî û bi peyre û program li darket, û **Encumena Niştimanî Kurdî li Sûriyê serperîştîya wê kir û bû dengê milletê kurd**, Rêcîma Diktator a Şam ê çavên Zer di nav Kayê de dîtin, û bilez destê xwe paland û li Hespên xwe yên Zinkirî geriya.

Anku em li vir li ser du Şepolên Kurdî cuda diaxivin, erê herdu Kurd in, lê ji bilî têkiliya netewî de, di tiştê de jî naşibihin hev. Bi tayîbet di van her Sê xalên bingehîn de:

1- Dîtin û nerîna li ser pirs û hebûna milletê Kurd li Sûrî.

2- Helwesta ji Rêcîmê.

3- Helwesta ji Şûreşê

Dêmek em li vir li himber bobelatekê ne, an jî bi wateyeke din, Volkanê ku Ter û hişk bi hev re dişewitîne.

1- Encumena Niştimanî Kurdî li Sûriyê (ENKS) e. ku deng û Ojdanê milletê Kurd e li Sûrî.

Şepola bi aqil, hêmin, û bi xebata sivîl, siyasî û aştiyane ava dike.

2- Partiya Yekîtiya Demokrat **PYD ê Hespê Rêcîmê yê zînkirî ye.**

Şepola Ehmeq, heta bi movika piştê xerimandî (مخترق) bi hêza Tifingê, gef, kuştin, talan, derw û bêbextiyan wêran û talan dike.

Encumena Niştimanî Kurdî li Sûriyê (ENKS) di 26.10.2011 an de bi beşdarbûna bêtir ji 255 kesan û bi Dehên partî û rêxistinên siyasî û sivîl hate damezirandin. Piştî paymana Dehok ê Encumen berda Sê partiyan ji nav xwe ew jî ev bûn:

1- partiya Yekîtiya Demokratî Kurdî li Sûrî –Yekîti (Şêx Alî)

2- partiya Çep a Demokrat Kurd li Sûrî (Salih Gedo)

3- partiya Demokratî Kurdî li Sûrî -Al Partî- (Nisredîn Ibrahîm)

ku ew jî êdî tevî refê PYD ê û Rêcîmê bûn.

di kongira Sêyemîn ya Encumena niştimanî Kurdî de, ku di 16.06.2015 an de Partiya Pêşverû jî xwe ji Encumenê vekişand. Û Encumena Êzdiyên Sûrî bi tevaya dengê beşdarvanan hate pejirandin weku rêxistineke siyasî mîna her Partiyêke siyasî Kurdî di hundirê Encumenê de.



Çima kurd nebûn dewlet

Di demê îro de kurd ji komên mirovên mezin û yekemîn li cîhanê mane bê welat, tewrî KU karek û xebat herî mezin bi karanîn, û kurd ji

yekbûyî yên millet nîşan dide KU di jiyane parçebûnê de ma di nav bera çar welatên nû pêdabûn piştî rûxwendina û hilweşandina dewleta osmanî, di nav çar dewletan parvekirin (tirkiya -îran -îraq -sûriya.(Da KU ji welatê xwe sebixwe nebû ji destpêka sedsala 20 an,kurd berxwedide ji bo welatê xwe Çima kurd man vê dewlet 'Çi sedem hene KU kurd ne bûn dewlet 'Gelo şert û şîretên nebûn dewlet çine,ma sûcê kurdaye lê sedemin dî hene 'Kurd ji roj rojê bûne qurbanî ya nav neteweyên stemkarên roj Ava û bûne di bin berjewendiyên lîstika hêzên cîhanê, tevî kurd têkoşîna serhildanan û şoreşan timî berdewame (hefid -şêx se'îd -dêrsim -mahabad)hwd.Eger em şîrovekin van sedeman pirtûka duniyayê besê nakê ,lê hema yê serek bidin xuyanî kirin, yek jê li hev kirina peymanên nav dewletî li serê kurda kirin, taybet (seykes bîko -mosok -sîver -lozan)hwd.Û yek kolonyalîzma rojavayê(Firansa -Îngltera -Rosîya)hwd, rola herî mezin bi karanîn KU kurd nebin dewlet, kaxeza kurdî ji xwere kirin paspora derbazbûna wan li rojhilata navîn, û destê xwe dînin ser mal û berjewendiyên xwe li wan deveran, û kontrol bikin û dest dînin li ser nefta kurdistanê di dewletên Îraq -Îran -Sûriyê -tirkiyê,û desthalat bikin ji bo xwe. Kaxeza kurdî di destê xwe de bihêlin û bibe gefa dijî van dewletan, lê hema kêf xweşiya dewletên dagirkerên kurdistanê jî tê ji ber ew jî sûdê dibînin ji erdnîgarê Kurdistan, Çi ji petrol û dar û beran û hwd.Hema tevan kurd kirin kaxeza joker di lîstika berjewendiyên xwe .Îro ji kurda tê xwestin kar û xebat bi şêwekî nû, û xwe bidin hînkirina perwerdehiyê û saz kirina rêxistinên xwe bikin û taybet ya xwe nîşandane rêbaza kurdatiyê, û xwe rêzgarkin ji bandira dijmin û têklêyên vê sûdê li doza me kurda, kurd jî berjewendiyên xwe bikin ji ber kurd miletekî dîrokiye û kevnare .Ezê hînim ziman peyman seykes bîko ji ber defretek baş ji bo dewketek sebixwe ji kurdara hebû, lê biryara Firansa û Îngiltera bi tirkiya ra hebû nehiştin kurd bibin xwedî dewletek serbixwe bin ji van rojana astengî û kirîza ji kurda er çêkirin tev dewletên dagirkeran, û zor û dijwarî anîn serî kurda û sînor da kirin nav kurdan, rewşek ne baş li serî kurda kirin û partiyên di her beşekî de bû bi pirogramek taybet li gorî parçeyê KU kurd lê dijîn, ev yekemîn parçe di nav kurda kirin û ji wê û pêve kurd ta niha di van rewşan de dijîn.EM kurd 30 -50 m hene vê dewletin, lê îro gavin pêş kirin û taybet nimûnek baş bi ci anîn kurdistanana fîdral (Îraq),bi rêveberiya nemir mistefa barzanî û bi berdewamiya kek Mes'od barzanî û bi hêzên gelî kurd û pêşmegên qehreman kurdistanana xwe gîhandin vê pûlê û roj ji rojê nêzîkî serxwebûnê di be piştî riferandomê Kurdistanê ,lê hema ji kurdan Çi tê xwestin KU ev nimûne berdewame bibe Tê xwestin yek bûn û piştgirîya va nimûnê bikin ji ber îro çar dijmin û hêzên tîrorê DA'ÎŞ tev dixwezim va nimûnê hilweşînin ji ber vê yekê kurd hemî dest û ra man bikin yek û kurdistanana xwe biparêzin



Serhan Isa: Mîr Tehsîn Beg û Êzdiyên Sûrî

Kurtejiyan: navê wî **Tehsîn Seîd Elî Beg** e, di 15.08.1933 an li Baedra Şêxan ji dayîk bûye, piştî mirina bavê wî **Mîr Seîd Elî Beg** bi 15 rojan, di Havîna 1944 an de Dapîra wî **Meyan Xatûn** ew ragihand wek Mîrê Êzdiyan li Cîhanê.



Piştî ku (Mîrê kor) bi xiyamet Mîrê Êzdiyan Mîr Elî Beg di sala 1875 an de kuşt, paşê Mîr Hisên Beg bû Mîr. Mîr Hisên Beg Şeş kurê wî hebûn navê wan jî ev e: **1- Mîrza Beg, 2- Elî Beg, 3- Silêman Beg, 4- Bedîh Beg, 5- Hesên Beg, 6- Selîm Beg.** Hetanî salên 1885 an **Mîr Hisên Beg** Mîrîtî kir, paşê **Osmaniyan** 4 sal ceza danê û ew di zindanê de giyan sipart.

Paşê kurê wî yê mezin **Mîr Mîrza Beg** bû Mîrê Êzdiyan û ji sala 1885 an hetanî 1892 an Mîrîtî kir. Wê çaxê **Ferîq**

Wehbî Paşa waliyê Mûsilê bû. **Wehbî Paşa, Mîrza Beg** vexwendî Mûsilê kir, û Ber ê Sor jê re rayêxist, lê piştî ku merasîmên leşkerî bi dawî hatin, Şûr danî ser stiwê wî û jê xwest ku **Şehdebûna xwe bîne û bibe Misilman**, û ji bo ku Êzdiyan biparêz e **Mîrza Beg** daxwaza **Wehbî Paşa** bi cî anî, lê dîse ew Dîl kirin û bi xwe re birin û avêtin zindanê, û di encama iskencê de, jiyana xwe ji dest da.

Piştî mirina **Mîrza Beg, Mîr Elî Beg** di sala 1898 an bû Mîr, lê dîse ew û **Meyan Xatûn** hatin neftî kirin û avêtin **Sîwazê**, piştî vegera wî di sala 1913 an de bi **Xencereke xiyametê** hatin kuştin. Paşê **Meyan Xatûn** kurê xwe **Seîd Beg** kire Mîr. Û piştî mirina wî bi 15 rojan û di Havîna 1944 an de Dapîra wî **Meyan Xatûn** neviyê xwe yê 13 salî ragihand wek Mîrê Êzdiyan li Cîhanê.



Ji ber temenê wî yê biçûk Mîrîtiya wî nedihat pejirandin, lê zîrekî û destdirêjiya Dapîra wî **Meyan Xatûn** ku Erd û Esman dihejand, dikarîbû di demeke kurte de, tevaya serokeşîr û rîsipî û oldarên Êzdiyan bicivîne û wan aşt û razî bike bi mîrîtiya **Tehsîn Beg**. Her weha di cî de têkilî bi **Wezîrê hundir yê Iraqê yê wê çaxê** re kir û jê daxwaz kir ku temenê **Tehsîn yê 13 salî** di nasnameyê de mezin bike, daku

li gor zagona Iraqê weku Mîr û Perlemanter bê pejirandin.

Tehsîn Beg û nemir Mela Mistefa Berzanî:

Têkiliyek pir xurt û bi hêz di naverba **bavê Kurdan nemir Mele Mistefa Berzanî û Mîrê Êzdiyan Tehsî Beg** de hebû, ji ber vê yekê jî di sala 1959 an de, û bi behaneyê piştgiriya wî ji **Şûreşa Berzanî** re



hate binçavkirin û ew nefî **Al Amara** û **Dîwaniya** kirin, paşê li **Bexdad** ê kirin bin nişteçîbûna bi darê zorê.

Lê nemir Berzanî hawara xwe gihande desthilatdariya Bexda û Efû jê re deranî.

Piştî salê 1975 an, ji Iraqê derket û berê xwe da **Birîtaniya û Ewropa** hetanî salê 1991 piştî rizgarkirina her Sê parzêgerên Kurdî careke din vergeriya Kurdistanê, lê vê carê li kêleka **Serok Mesûd Berzanî**.

Hêjayî gotinê ye, ku nemir **Mele Mistefa Berzanî**, di dema Şûreşê de, di civînan de digot: Kurdên Êzdî hun du cara bi xêr hatin, carekê ji ber ku hun tevlî Şûreşê bûne, û careke ji ber tevlî vê rewşa we ya dijwar hun

hewil didin ji civînan nemînin.

Mîr Tehsîn Beg di danûstandin, têkilî, civak, ol û siyasetê de pir jîr û zana bû, û bi hêminî û bîna xwe ya fereh û jîrebûna xwe xwe û Êzdî jî, ji gelek bobelatên mezin rizgarkirin.

Di 25,26,27.07.2014 an de Encumena Êzdiyê Sûrî kongirek giştî ji bo Êzdiyên Sûrî di bin çavdêriya wezaretê derve ya Espanî û yekîtiya Ewropa de li **Medrîd** li darxistin.

Bêguman beşdarbûna Mîrê Êzdiyan li cîhanê **Mîr Tehsîn Beg** di wî Kongirî de pir pêwîst û pêdivî bû.

Lê pirsgirêk ew bû, ku me zanîbûn ku Mîr li civîn û Kongirên bi vî rengî tu carî beşdar nabê.



Lê em bê hêvî nebûn û me di cî de têkilî pê re kir, û me jê daxwaz kir ku li Kongir beşdar bibê. Piştî çend rojan ji danûstandin û têkiliyan Mîr biryar da ku beşdar bibê.

Bêguman **Mîr Tehsîn Beg** li ser Belgenameya Kongir imze kir. Lê di wî Kongirî de axaftinek pir balkş got: ku hun **Encumena Êzdiyên Sûrî** li ser rîya rast û durist in, û eger me Êzdiyên Iraqê wekî we ji xwe re bi vî reng û temtêlê kar kiribe, em ê anuha ne di vê rewşê de bûne.

Wekî din di gelek kar, xebat û biryarên xwe de em pê dişewirîn, û me bêyî Erê ya wî tu gavên mezin neditavêtin. Her weha her bûyereka an jî biryareka ku bi Êzdiyên Sûrî ve girêdayî bûye, Mîr di cî de têkilî bi me re dikir û pirsê nerîna me dikir. Piştî dagîrkerina **Efrîn** ji aliyê Dewleta Tirk û hevpeymanên wê ve, û ji bo rewşa Êzdiyên Efrînê em gelek caran pê re ketin têkiliyê, dawîtirîn rûniştin û dîtina me li gel **Mîr Tehsîn Beg** di meha Tebaxê sala 2018 an de bû. Ji wan Şîretên wî ji bo me digot: **hun bêyî mîletê Kurd ne tişteka in, gereke hun xwe dûrî wan nekin. Û divê têkiliya we bi hemî pêkhatên Sûrî re xweş û xurt be, heta ji wê bê dijminatîya tu kesî nekin.** Mîr Tehsîn Beg di 28.01.2019 an de giyan siparte Yezdanê jorî, Hezar rehma Xwedê lê be. Û wê bi merasîmeke mezin û fermî roja Duşembê 04.02.2019 an li **Firokxaneya Hewlêr** ê cenazeya wî bê pêşwazî kirin.

Emîndariya giştî ya Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Qamişlo

di 1ê Sibatê 2019 an de li hevdîtînê rewanên pakrewanan , rojeva siyasî de, tevî çalakiyên nûnerên Encûmena Niştimanî ya kurdî , û serdana komîta serokatiya hevdîtina Serok Mes'ûd Barzanî, Yekîtiya Îslama Kurdistanê, û Piştî axaftina berfirehtir ji endamên



hevdîtînê pêk hat: Emîndariya geştî Pejirandin nerîna rastiye ya encûmenê di derbarê Reforma siyasî de û razîbûna xwe da xwiyanî di derbarê hevdîtînê ku vê dawiyê derbasbûn emîndariyê daxwaz kirin jî helwesta Serok Mes'ûd Barzanî jî û guhdana cenabê wî li ser rewşa Kurdistana Sûriyê û piştgiriya wê û piştgirîkirina Encûmena Niştimanî ya Kurdî û Mafên gelê Kurd li Sûrî destnîşan kir. Civîn jî xurt kir divê pêwiste ku bi tîkiliyên navneteweyî û herêmî re tîkildarî bi beşên navdewletî re û herêmî yê agahdraên kar û barên sûrî re ji bo çaresariya siyasî ya rewşa niha çalak bikin û pêşveçûnê da ku bixînin sîstema desthilatdariya demokrasiya federal ya ku çalakiya gelemperî mafê hemî mafên demokratîk û gelê Kurd li Kurdistana sûriyeyê bi taybetî di nav wan de neteweyî û rastdariya li gor peymanan navneteweyî û peymanên navneteweyî û garantî Ji ber ku projeyên ku li herêmên kurdî û deverên Rojhilata feratê tene pêşkêş dikin, ku taybetmendiyên van projeyên ne diyare û di vê çarçoveyê, Encûmen dê li derdora navneteweyî û herêmî digerin ku ji bo parastina gelê me û her cûreyên din û herêmên xwe li dijî metirsiyên ewle ewleh bikin û hevdîtînê pêk tê. Û Encûmena Niştimanî ya Kurdî di tevahiya sûrî de girînge û ku Pêşmerge roj rola wan hebe di parastina ewlehiya gelê me û herêmên me de , û aramiya welatên derdorên me ku bi avakirina tîkiliyên baş li ser bingeha rêzdariya hevwerengî çêbikin, biparêzin. Wek emîndariya Giştî dît ku hewayî ta niha tune ye ji bo bicîkirina yekîtiya helwesta kurdî tevî vekirina nîvîsgeha û radestkirina wê ji xwedîyan re bê ku kesî bihêlin û azadiya çalakiyên siyasî û gelemperî û serbestberdana girtiyan Tewandina vê pelê û daxwaza vegeandina yê dîrketin bi zorê û zelalkirina dravên li dijî welatiyan û vegeandina malên wan û divê rêjoriya medyayê rawestin ya ji belî ragihandina pyd ê diderbarê rêberên û serkerdê Encûmenê de Niştimanî ya Kurdî de û partiyên wê, û ev ku di heman demê de nîşan dide ku nebûna, rastiye di hefkariya wan di yekîtiya rêza kurdî de û ev nerastiya wan bicî tîne û dide xuyanî ku ev piştirast dike ku nebûna baweriya bi bangên xwe de ya bo encûmenê û partiyên wê, ev ew garantiya ku dabeşkirina bilind dike û kiriye destpêka diyaloga nabe ku ne li ser erdê de derbasdar minasib ji bo atmosfera berê û hebûna garantiya navneteweyî û herweha. û emîndariya giştî bi rêya civînên bi hemû pêkhatên civaka bi cî dike li ser pêşxistina karê encûmenê û activation xwe ya ji bo avakirina helwesteke hevpar bazûyên gefên li herêmê û parastina aştî û sivîl û parastina û her wiha tekez li pêşxistina ragihandina encûmenê ya ko cihê wê başî yê siyasî û gelemperî Emîndariya Giştî ya Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê.



QASIM MER'İKA

Memdûh Selîm

1880-1976

Li Wanê hate dinyayê, li Mektebî Mulkiyeya Stenbolê xwend. hîn çaxa dixwend, sekreteriya cemiyeta "Hêvî" ya ku hate damezirandin kir. di sala 1914an de tevî xebatên derxistina rojnameya Rojî Kurd bû û kete nav lijneya weşanê. demekê jî redaktoriya kovara "Jîn" ê kir. Zimanekî başe nivîsandinê yê Memduh Selîmê ku di nivîsên xwe de daxwazên meşrû yên Kurdan dianî zimên hebû. Bi îlankirina Komarê ji ber ku zextên li ser wî zêde bûn mejbûr ma û derbasî Sûrî bû. Di



Serhildana Dêrsimê de, bi wezîfedayîna Seyit Riza, tevî Baytar Nûrî, ku derbasî Sûrî bibû, bi konsolosxaneyên biyanî ketin têkiliyê. Buyerên li Dêrsimê diqewimîn ji rojnameyên biyanî ve digotin. Di sala 1927an de kete nav rêveberên "Xoybûn" ê. Nûnêriya "Xoybûn" ê ya navneteweyî kir. Di nav Koma ku serhildana Agirî tev digerland de cî girt. Di dema salên pêş yên sirgûnê de tevdurustiya wî xera bû, di nav tengijîna aborî û di nav feqîriyekê de li Sûrî mir...



Ehmed dêrşewî û Mûzexaneyê dêrikê ya filklorê kurdî

hemû bajarên cîhanê guhdan ji warê filklor re heye û li bajarê me kurdan gelekî guhdana kevnetor û filklor heye ber mîletê kurd bêhtir zengîn e bi filklorên xwe, ji ber vê yekê em dibînin ku guhdanên taybet hene di warê pêşengî û mûzexanan de, yek ji wan mûzexanan ku payemêrên wan ne li cem sekinî Mûzexana dêrikê ku guhdanek taybet ji filklor û kevnetorê kurdî re hebû ji bilî xwediyê mûzexanê Ehmed dêrşewî bavê şivan ku karîbû hinekî karê xwe ji me re bide xuyanî û got : di yekê meha 3 yan de li bajarê dêrikê min bi dest karê xwe kir û mûzexana min vekir ji ber ku ne li bajarê dêrikê û ne li gundên wê mûzexan e hebûn. Min bi dest mûzexana xwe kir ji şed berçeyên kevnetorên kurdî ku îro gihaye 700 perçî yên kevnetor ji filklor û ji karê destan û meşk û cercere û gelek perçeyên din ta bi wêneyê bavê mezin berzan, birastî ger alîkariya karîbû ji min re heba wek hemû mûzexanên cîhanê min ê karîba mûzexana xwe gelekî pêş xistiba lewra ev erk tê westin ji hemû hêzên xuyanî wek partiya wek rêxistina ji ber ev mûzexan ya mîlet tevî ye û kesên alîkarbûn bi min re ew kesên feqîr û xizan bûn û kesên têr û dewlemend tu alîkariya wan bi min re tune bûn, Ev mûzexana yekemîne li bajarê dêrikê .hêvî û daxwaza me jî ew e ku alîkariya Ehmed dêrşewî bê kirin û em serkeftinê ji bo karê wî di xizmeta filklor û kevnetorê kurdî de dixwazin.

Isra Zibêr

Pisgirêka xazê û mazotê û desthlatiya pyd

Ev zêdî pîst rojan ku taxa elî fero ya taxa xerbî li bajarê Qamişlo ku bê mazotin û bi serde qutbûna xazê ku ev mehek û bêhtir divê sivistana sar de gelê Qamişlo bê xazin

Divê derbarêde jineke bi navê Fehîma : hesen ji peyamêrê mere got

Ev zêdî mehekêyê ku kufletê me bê xazin û em li çêkirina xwarina xwe dimînin heyirî dibêjin me harin komîna navê xwe deynin me navê xwe jî danî lê mixabin ne li gorî barê xwene

Di vê pisgerêkê de jinekê din ji taxa xerbî bi navê xanimê ûsiv ji peyalêrê : mere got

Ev mehek me em bê xazin û bê mazotin dinya gelekî sare ku em tifka pêxîni li hewşê ji bo em xwarina xwe li ser çêkin ma gelo em vejeriyane kîjan demê

Belê xanê bi vê gotinê gelekî melûl bo û dest hilatiya pyd û gefên wê li ser gel gelekî giran e

Ferhad Şêxo



Ebdil'îlah ûcê

EBDIL'ÎLAH ÛCÊ: DIVÊ PYD'Ê XWE JI PKK'Ê VEQETÎNIN, Û RÊVEBERIYEK HEVBEŞ JI HEMÛ ALÎYÊN KURDÎ Û PÊKHATEYÊN DIN AVA BIBE .

Rojnameya Encûmen vê hevpeyvînê ligel cîgirê sekreterê Partîya Yekîti Kurdistanî - Suriya Ebdilîlah 'ocê pêk anî li ser herêma ewle û rewşa Kurdistana Sûriya:

-Heger herêma ewle bi serpereştiya Tirkiyayê çêbibe hûn çawa vê yekê dinexînî?

-Em helwesta xwe li ser bingeha erê na ava nakin, ta niha bingeha herêma ewle ne diyar e, û di giftûgoyan de ye navbera welatên zilhêz di warê kirîza Sûriyayê . Dema ku bingehên wê bîn diyarîkin ewê helwesta me zelal u berçav be ji herêma ewlehiyê .

-Mosko daxwaza cîbicîkirina rêkeftina Edena dike û Tirkiyeyê radigihîne ku ewê rêkeftina Edeneyê aktiv bike, gelo çarenivîsa Kurdistana Sûriyê di nêrîna we de ber çi rengî ve diçe?

-Cîbicîkirina rêkeftina Edena li gorî nerîna Mosko divê ku rojhilatê çemê Firatê di bin kontrol û siya rêjîmê be, û ev yek ji aliyê Emerîka û Ewropiyan û Tirkiyayê cihê nerazîbûnê ye.li gorî têbîniyên me ku Emerîka daxwaza çêkirina herêmek ewle di bin çavdêriya hevpeymaniya navdewletî ji bo razîkirina dewleta Tirkiya, û parastina Kurdan ji hemû metirsiyan, çêkirina rêveberek hevbeş nav bera hemû pêkhatiyên li Rojhilata Ferêt dimînin, û çêkirina hêzek ewlehî hevbeş ku hemû li ser razî bin û pêşmergeyên Roj beşek ji vê hêzê be .

-Çi ji tevgera kurdî tê xwestin ku metirsiya êrîşkirina dewleta Tirkîyê li ser Rojhilatê çemê Firatê li Kurdistana Sûriyê rawestînin?

-Tê xwestin ji partiya yekîtiya Demokratîk (PYD) ku xwe ji partiya Karkerên Kurdistanê veqetînin û hemû çekdarên xwe ji erda Kurdistana Sûriyê derxînin, û avakirina rêveberiyek hevbeş ji hemû aliyên Kurdî û tevlîkirina pêkhatiyên din di nav vê rêveberiyê de, û avakirina hêzek hevbeş ji hemû aliyan, û peyamên erênî diyar bikin ku rêveberiya nû rêzgirtina peywendiyên cîrantiyê bi Tirkiyayê re û bi cîhkirina baştirîn peywendiyên bi wan re li ser bingeha berjewendiyên hevbeş

Şemdîn û Hemdîn xelesa (9)



di nav me de xwîn û kuştin çêbûye. Her des zilama jêre got me berê ji tere gotiye em ji tere gorîne tux we bavêjê behrê emê xwe li pêşiya te bavêjin avê her sed konîpêre barkir û berê xwe dane Zozanê Şeref dînê sê roja roja çara Hemdîn axa konê xwe di cihê konê bavê xwe de danî gomgomê qehwê li ser agir danîn û desmal li ser şerîtê kon danîn. Sibî Simaîl axa rahişte misînê nimêjê derkete ji derve diniya mij û morane dî va konekî li şûna konê Hisên axa daniya şingîna gomgom û misînê qehwê ye baş dêna

xwe da kon naskir kku ew konê Hisên axa bi xwe ye hatiye li çûna konê bavê xwe daniye. Simaîl axa zanî ku Hemdîn hatiye heyfa bavê xwe hilînê di serê xwede bir û anî ji xwe re got ya baş ewe ku ez herim xwe bavêjim tor û bextê Hemdîn o belkî rehim bikevê dilê wî û min efo bikê ev zilam herger ku ne ji bavê xwe zalim tirba ne dihat konê xwe li şûna konê wî danetanî. Dive ez xwe ji wan dût bikim ew ap û birazîne ya min çiyê ez bi kevîm di nav wan de serê wa li zikê hev. Axa yê min o simaîl axa bi sehara sere sibêre siwar bû û berê xwe da konê Menîca xatûn çû xwe avête bextê wê jêre got guneh ji piçûke û efo ji mezina ji bona xatirê xwedê ew birayê hev bûn û malê hev li deriya digerrîn in ya me çiyê tê me bibê cem Hemdîn o bila me efo bikê îşê me ji van galgal û gotinê ha nîne em û apê xwe inşaela yek li cihê yê dî rûnê. Maqûlo min odilê min dilekî delo dîne hêhêhêh Simaîl axa ji Mencê xatûnê re dibêj ji bona xwedê tê efoya me ji cem Hemdîn o bînê Simaîl axa rahişte sola Mencê xatûnê li ser serê xwe danî. Dilê Mencê xatûnê bi wan şewitî rabû da pêşiya wan û berê xwe da konê Hemdîno. Mencê xatûnê kete derî û ji Hemdîn o re got lawo min ez ketim bextê te û bextê xwedê. Hemdîno ji diya xwe re got yadê ne hefoya apê min Ehmed û Simaîl be çi be ez efo bikim yadê tu çi ji min bi xwazê lê van bi tenê ji min ne xwaze. Mence xatûnê go lawo mino ev qerwaşin ne mîrekin îşê wan ji tiştêkî nîn e tê efoya Simaîl axa û bîst û pênc mîrekê Zozên bike îşê wa ji tiştêkî nîne berxê min o axa yê min o. Dema ku Hemdîn dî diya wî çi lavlav û zare zar û hêviyê jêdikê devê wî li ber diya wî negera rabû efowa Simaîl û bîst û pênc mîrekê Zozanê jorî da û ji Simaîl axa re got tê herê gelek silava li apê min bikê bila xwe ji min re berdê meydanê bi qesema nave xwedê ez narûnim yan wê min jî weka bavê min bi kujê û yan ezê wî bi kujim û yan wê ewjî weka min xwînî bibê û çend sala herê welatê xerîbiyê ta ku rehim têkevê dilê min ezê herim wî ji welatê xerîbiyê vegeerîn im paşayê min o. simaîl bi lez ji bin konê Hemdîn derket û berê xwe da konê Ehmed jêre got axa yê min o dilê min dilekî delo dîne xuyadikê te haj bayê felekê nîne rabe dêrbûnê li ber çavê xwe deyne û binêre wa Hemdîn axa konê xwe li çûna konê bavê xwe daniye bi qesem nave xwedê ku lit e werê xezebê wê koniya bavê te ji diniya yê bi qetînê. Hemdîn gotiye bila apê min karê xwe bikê û xwe ji min re berdê meydanê bila mêr bê û bi kêrî xwe werê û yan konê xwe barkê ew jî weka min çend sala li welatê xerîbiyê deyne piştî çenda sala dibê ku dilê min pê bişewitê ezê herim wê vegeerîn im.

Amadeus Mozart peyva min verist

Min xewnek dît;
dubare me hev dît
di nav tutinê de
qehwê û piyalek şerabê de
serxweş dibûm
Kolanê dengê min nas kir,
dewsa piyên min strana jivanan bû
ez û te bêden li hev rûdiniştin
dûr li kevîka şevê,
li ber qurmê darekê
min ramîsanek xwest
diket, radibûm..
destên te...
hizra min xalek bû,
reş, bi xwelî û xwê..
Ba dora me girt,
derzek hebû
sîbera darekê wê şevê
xeftanê hizra me bû
(kesekî ji me guh neda tirsê)
Seg parêzerê sinoran bû
Êşa te giha erşê azman

Tengezar Mîranî

Li hemberî te
Ne pey, ne deng
Tu duyê çixarê û awirek
Çend reng li ber çavên min lîstin
Kêliyekê,
te Mobila xwe hilgirt
ez bûme baran
Çavên min di kunçala gerdûnê de
Dilê min
Werîsekî hesinî
Ba xelekên kor in
Ez bê arman
Tu bê nîşan
Çirûsk/dem/Beraz/
sed salên şîn/şikestin
Pencere/şikeft
Hundur/derve
kavil/biyani
Êvar hîn sax e





Hesên Eyûb

Lav kirim?

**Wê ji dilda kir dirûdek pê dav kirim
Ma li kê kir wê sirûdek wek xav kirim
Ez bi şadî bûm bi yarê wek jê birim
Wek bi tîran dame lêmiştê gav kirim
Hole hol çûna te ger xweş ket nav dil e
Hêlê hêl têtin ji rex wê bin çav kirim
Ger di çolan da beyarbûn bê ber cida
Berve xawî kirme tî hîşt bê av kirim
Xirexalî bû bi tenha hîştim bila
Ez li wir mam bê ku dar û ber lav kirim**

B.k.30.01.2019



Birahîm Qasim

Her bijî tu ey welat

Xeml û xêlê dê girêdim ber te va tîm ey welat
 Şev û roj û ba û baran, ez li ser te bê tebat
 Ber dil û canê minî tu ez evîndarê te me
 Ez evîndarê te me ez her bijî tu ey welat

Dûrî te ez bê hedan im nîne aram û jîyan
 Ger bidin min qesr û eywan zêr û gewher û xelat
 Berjewendî l`nik min hîçin ez bisoz û hem viyan
 Her dibêjim ez bigorî her bijî tu ey welat

Dax li ser daxê dinasim hîn ji mêj de ez dixwim
 Kuştin û talan û wêran agir û pêt û şewat
 Kul û derdan dê ji bîrkim serfiraz dê her bijîm
 Her tu ware me Kurdanî her bijî tu ey welat

Xweştirîn cî Kurdistan e nav gul û baxê te bim
 Ku muradê min bibêtin çêtirîn bo min xelat
 Nav nivîn û palgihê te dê vehest û dê nivim
 Ez bi feryad û fixanan her dibêjim ey welat

Ey welat ev çend hezar sal em di qeyranê dijîn
 Em di bindest kuştin û dav şer û xap û ev şewat
 Ax û av û zêr û zîwer ter û şînî tîm dizîn
 Ta bijîm dê her bibêjim her bijî tu ey welat

Ey welatê bav û kalan çar kinarê te dijmin
 Xwînrijên û tev kujer û hem gemar û pir sîfat
 Wek sulavan tête xwarê sor e dejla û ferat
 Hevrik û bend êk re bêjin her bijî tu ey welat

Her di bakim vî dilê xwe ka ne nale carekê
 Sebr û aramê kişîne va ye roja me hilat
 Ser ser û cavê me bêtin roj û şevên xoş û şeng
 Dê di himbêza te bêjim her bijî tu ey welat